Bundesamt
für Migration
und Flüchtlinge

Belavoka Kursa biyekbûn

bo

- Penaberên bi izina rûniştinê ligor zagona.§ 55 ji benda. 1 AsylG (Zagona Penaberîyê),
- Bîyanîyên helgirtî zagona § 60 benda. 2 hevoka 3 AufenthG (Zagona li ser Rûniştin, Xebatên Abûrî û Biyekbûn a Kesên Biyand di Herema Federal) û
- Bîyanîyên bi izna rûniştinê zagona § 25. benda 5 AufenthG

Birêz,

Hûn dikarin bo erê kirina beşdarbûna xwe di kursa biyekbûnê di Bundesamt für Migration und Flüchtlinge (BAMF) (Ajansa Federal bo Koçber û Penaberan) da daxwaza pêşkêş biken. Bo ev karî, divê hûn yek ji mercên jêr pêk bînin:

- Hûn penaberekin, ku we izina rûniştinê heye û di rehiştê da hevwelatîyê yek ji welatên jêrin :
  - Îran
  - Eraq
  - Sûrîya
  - Erîtrea
  - Somali

Be wî, we ji bo mafê penaberiyê li welatekî din yê endam yên Yekîtîya Ewropayê serî li Penaberîye ne lexistîye an jî ji aliyê qanünen -Dublînê III mecbûr pêdivî serîlêdana xwe li Dewletekî din ê Endamê Yekîtiya Ewropayê da jib o Penaberîye de bidin hundir.

yan

- Hûn di rewşa helgirtî bûna zagonî da ne li gor zagona § 60 benda. 2 hevoka 3 AufenthG yan izineke rûniştinê zagona § 25 benda 5 AufenthG.

Têmîkirin: Ger dema serîledana we ji bo mafê Penaberîye de an ku dema hevpeyvînê şexsî ji bo mafê penaberiyê ji we standine destüra ji bo tevlebüna kursa dane we, wî deme gerek tune Hûn serba qebulkirina tevlîbûna qursê serîleder bidin hundir.

Zarrok, nûciwan û ciwanê ku hêşta di temenê dibistanê da ne û dibe beşdarî dibistanê bibin, nikarin di kursa biyekbûnê da beşdarbin.

Kursa biyekbûnê çîy e?

Kursa biyekbûna giştî ji du beşan pêk tê: Kursa ziman û kursa hînkirinê .

Di kursa ziman, peyvên ku di jîyana rojane da pêwîste hûn biaxivin yan binivîsîn, hûnê hîn bibin. Eve pêk tê ji pêwendî ya gel rayedaran, axavtina gel cîrana û di şolgehê, nivîsîna nameyan û tejî kirina forman .

630.121d (kurmanci) BAMF 04/2017

Kursa hînkirinê jîyan di Elmanîya yê da fêr we dike. Livir, hûnê ser rêzikên zagonî, çand û dîroka ev dawîya welat da agahîyan bidest bînin.

Kursa biyekbûna giştî pêk tê ji kursa ziman bi 600 civîna (her civînek 45 xûlekan) û kursa hînkirinê bi 100 civîna. Kursa ziman pêk tê ji şeş beşan ku her beşek 100 civîne. 300 civînê destpêkî kursên binertî tên binav kirin. 300 civînê paêş kursa ziman ya pêşketî.

Herwisa kursên biyekbûnên taybet bo nimûne bo jinan, dêbava, nûciwana û kesên ku bi başî nikarin bixwînin yan binivîsin. Ev kursene pêk tên ji 1.000 civînan .

Eger hûn bi taybetî xwendekarek hêja bin, hûn dikarin beşdarî kursa tîndar bibin . Ev pêk tê tenê ji 430 civînan .

Navenda ku kursa biyekbûnê pêk tîne, "rêkxerê kursê", tê pêş destpê kirina kursê testa destebendî yê ji we bigir e. Eve tê zelal bike ka kîjan kurs û beşa kursê ji were bi destpêkê kêrhatî ye. Testa destebendî yê belaşe .

Beşdarbûn di testa dawî da

Testa dawî pêk tê ji testa ziman û testek di dawîya kursa hînkirinê, ku "Jîyana di Elmanê de" tê binav kirin Eger hûn di testa zimanî da belgeyên hêja di şarezayîyên zimanî da bidest bînin (asta zimanî ya B1) û testa "Jîyana di Elmanê de" derbas biken, hûnê bi serkevtî kursa biyekbûnê temam biken. Hûn tê "bawernameya kursa biyekbûn" verbigirin.

Eger hûn di yek yan du testan da biser nekevin, hûn tê piştrastkirina encamên xwe verbigirin .

Beşdarbûna di testa dawî da belaş e .

Qebûl bûn di kursa biyekbûn da ji alîyê Desthilatdarîya Federal û qeyd kirina ji alîyê rêkxerê kursê pêk tê.

Kerema xwe daxwaza xwe bo qebûl bûnê bi tevahî û xwendinbarî pirr biken. Eger nîşanîya ku we qeyd kirîye bi navek xênjî navê we ye, pêwîste ku hûn beşa “Niha li (c/o) da dijîm” (bi Elmanî “Gegebenenfalls wohnhaft bei (c/o)“) jî pirr biken, xênjî vê poste nagehîşe destê we. Lîsteya belgeyan di sepanê da kom bike û paşê bo nîşanîya zelal bûyî bişîne.

Pê îmza kirina daxwaza nameya qebûl kirinê, hûn qebûl diken ku Bundesamt für Migration und Flüchtlinge dikare daneyê we bo mebesta pêkanîna kursa biyekbûn kom bike, lêkolîn bike û bikar bîne û wan li gel daneyê berdest di Ajansa Federal bo pêk anîna pêvajoya penaberîyê têkel bike. Eve bo bergirî kirin ji vê ye kesê ku di kursa biyekbûn da tê qebûl kirin ev kesin ku niha di welatek dî yê endamên Yeketîya Ewropa da yan di welatek berpirs li gor zagona Dublîn III di her welatên endamên Yeketîya Ewropa da daxwaza penaberîya xwe pêşkêş kirîye. Xênjî vê, divê bê destnîşan kirin ku welatên dî yê endamên Yeketîya Ewropa li gor zagonên dî yê Yeketîya Ewropa girêdayî bi pêvajoya daxwaza penaberîya te nînin.

Herwisa pê îmzaya xwe hûn qebûl diken ku, eger gengaz be, danberhevek gel daneyê kombûyî di navenda qeydkirina netewyên bîyanî da bê kirin. Eve bo taqîkirina rûniştinê ye ku bi rewşa helgirtî bûna zagonî li gor zagona § 60a benda 2 hevoka 3 AufenthG (Zagona Rûniştinê, Xebatên Abûrî û Tevlîbûna Bîyanîyan di Herema Federal da) yan izina rûniştinê zagona § 25 benda 5 AufenthG hatîye derçûn.

Eger hûn di kursa biyekbûnê da qebûl bibin, Ajansa Federal tê ji were bawernameya piştrast kirina beşdarbûna we di kursa biyekbûn da bişîne, "Bawernameya xwedîmercbûnê". Hevdem gel bawernameya xwedîmercbûnê, herwisa hûnê lîsteya rêkxerên kursê ku di nêzî rûniştgeha we da, an ku nizike Cîhe Hûn iqama dikin kursa zimanan pêşkêş diken, verbigirin.

Têmîkirin: Ger dema serîledana we ji bo mafê Penaberîye de an ku dema hevpeyvînê şexsî ji bo mafê penaberiyê ji we standine destüra ji bo tevlebüna kursa dane we, wî deme gerek tune Hûn serba qebulkirina tevlîbûna qursê serîleder bidin hundir.

Rêkxerê kursê dibe we hêvîyên destpêka kuirsê agadar bike Divê kurs navbera sê hfteyan ji qeyd kirina te, destpê bike. Eger kurs serdem pêk neyê,divê rêkxerê kursê ji we agadar bike. Tu dikarî ku birayrrê bigrtî ka tu dixwazî zêdetir li bendê bimînî yan pey rêkxerek dî yê kursê penaberîyê bigerî. Di ev babetê da, pêwîste rêkxerê kursê bawernameya xwedîmercbûna we bizivirîne bo we.

Beşdarbûna guncav di kursê da

Bo gehîştina ji armancên kursa biyekbûn, pêwîste hûn kêrhatî beşdarîya kursê biken. Bi gotinek dî pêwîste hûn heta dawîya kursê û beşdarbûn di testa dawî da bi berdewamî têda beşdar bin. Beşdarbûna kêrhatî di kursê da giringe ji ber ku dubare xercên kursê nede yan dubare beşdarî kursa ziman di demek dî da bibî. Rêkxerê kursê eger hûn daxwaza biken bi nivîskî tê beşdarbûna we di kursê da piştrast bike.

Guhertina rêkxerê kursê

Tenê paş dawîya beşa kursê hûn dikarin rêkxerê kursa xwe biguherin.

Xênjî vê, gengaze hûn di babetên jêr da nava beşa kursê rêkxerê kursa xwe biguherin:

- Veguhestina malê
- Guhertina nava kursên nîv-demî û tam-demî
- Şol destpê kirin

Eger bi her sedemek dî bê guhertin, civînê di beşa kursa we ya niha ku êdî hûn beşdar nabin tê winad bibin .

Eger guhertin pêk bê, rêkxerê kursê pêwîste ku bawernameya xwedîmercbûna we bizivirîne bo we.

Xercên kursa biyekbûn ê

Beşdarbûna di kursê da ji were belaşe.

Xercên hatûçûnê

Hûn dikarin bo xercê hatinûçûna xwe ji Ajansa Federal alîkarî werbigirin. Merca pêwîst eve ku cihê kursê bêtirî ji 3 km ji mala we dûr be. Xercê hatinûçûnê tenê ji bo cîyê kursê nêzîk ji herwisa tê dayîn. Daxwza girêdayî bi cihê rûniştina xwe pêşkêşî nivîsîngeha heremî ya Ajansa Federal bike. Hûn dikarin bi serhêlî di www.bamf.de da binêrin. Peyva "Malper-GIS" lêxe nava beşa" Lêgerîn" ê. Eve tê we bibete nava dîmendera lêgerînê. Navnîşana xwe livir lêxe û bijareya "Têkildarîya nivsîngeha heremî li gel kordînatorê heremî" bijêre; paşê ser "Lêgerînê" bitikîn e .

Eger tu bi kêrhatî beşdarî civîna bibî gengaze hûn bo xercê hatinûçûna xwe alîkarî wer bigirin. "Kêrhatî" bi wateya beşdarbûna we di civîna da ye bi berdewamî .

Tê 300 civînê kursa ziman dubare bibin

Gengaze hûn 300 civînên kursa ziman di bin hinek mercên taybet da dubare biken Bo vê, divê hûn bi kêrhatrî û tevahî beşdarî kursa ziman bibin û paşê jî testa ziman we dabe. Herwisa test şarezayîyên Elmanî bi kêrhatî zelal nake (asta ziman ya B1).

Bo beşdarbûn di civîna dubare da daxwaznameyek pêwîste. Kerema xwe di nivsîngeha heremî ya Ajansa Federala têkildarî bi cihê jîyana xwe da tomar bike .

Eger tu dixwazî beşdarî kursê alfabê bibî, beşdarbûna pêşîyê di testa zimanî ne pêwîste bo dubare kirina 300 civîna.

Herwisa divê tu çi bizanî

Tevahîya formên daxwaznamê di belavokê da hatine û herwisa cem rêkxerê kursê, nivsîngeha we ya bîyanî yan di nivsîngeha heremî ya Ajansa Federala têkildarî bi cihê jîyana we da berdestin. Herwisa tu dikarî di malperê jêr da forma bibînî :www.bamf.de/formulare .

Belavok pêk hatîye ji agahîyên herî balkeş liser beşdarbûna we di kursa biyekbûn ê da. Rêkxerê kursê dikare bersiva pirsê we yê bêtir bide.

Maweya ku hûn beşdarîya kursa biyekbûn diken, hûn na kevin e ber bandora bîmeya bûyerê welat.

Em serketinê mezin di beşdarbûna we di kursa biyekbûnê da bo we hêvî diken !